Azadiya
# WELAT
Rojnameya Hefteyî
SAL: 1 11
31 Adar - 6 Avrêl 1996
BUHA: 50.000 TL

*Malbatên windayan:*

# Dilê wan goşt dixwaze...




Dayik, bav, xwişk û birayên windayan rabûne ji Wanê, ji Amedê, ji Kerboranê hatine Stenbolê; li lêzimên xwe digeriyan û ew ji dewletê dixwestin. Li ber deriyê Lîseya Galatasarayê rûniştin. Roja 25'ê adarê jî civînek pêk anîn. Lê baweriya wan jî zêde bi çapemeniya tirk tune bû. Lewma pîreka Ali Tekdağ, Hatice Tekdağ di encama civînê de ev gotin: "Em nehatine vir ku em wêneyên xwe bidin kişandin. Heke hûnê cih bidinê, bikişînin." Malbatên kurd tevî dîtina lêzimên xwe yên "windakirî" aştî jî dixwestin.

Rûpel 3

✓ A. MELİK FIRAT jî kete nav nivîskarên me. Fırat bi sernava "Dewr û daîma guran" sîstema kemalî şîrove dike Rûpel 4-5

✓ Heyeta îtalî, ku di Newrozê de çûbû Amedê wiha got: "Me fêhm kir ku em hatine welatekî dagirkirî" Rûpel 8 – 9

✓ Dewlet û dijminatiya zimanê kurdî Rûpel 11

✓ ŞANAR YURDATAPAN der barê qanûnên ne-demokratîk de wiha dibêje: "Emê wan qanûnan bidin bin piyan" Rûpel 10



**LI GORÎ** agahiyan hevdîtinên ku ev sê meh in di navbera PKK û PDK'ê de dom dikin, gihîştine encameke baş. Lihevhatina PKK û PDK'ê di warê pêkanîna Kongreya Neteweyî de wekî gaveke girîng tê nirxandin. Tê gotin ku Mesûd Berzanî ji bo pêkanîna Federasyoneke Demokratîk li Başûr, bang li Serokê YNK'ê Celal Telabanî jî kiriye. Dewleta tirk a ku dixwest PDK'ê bi Iraqê re li hev bîne, li ser vê peymanê gelekî aciz bû. Her wiha hewldanên Tirkiyeyê yên ku PDK'ê bike şirîkê operasyoneke li hemberî PKK'ê jî, bi vê peymanê têk çûn. Bi awayê ku çavdêrên siyasî dibêjin, PDK'ê hemû mafên ku ji bo rêxistinên başûrî hene, ji bo PKK'ê jî nasîne.



**MEBÛSÊ** Partiya Keskan Cem Özdemir li dijî guherîna Zagona Biyanan derket. Piştî meşên kurdan ên li Dortmundê, rayedarên alman ji bo derkirina kurdan, guherîna Zagona Biyanan anîbûn rojevê. Çapemenî û dewleta tirk jî bi vê yekê gelekî kêfxweş bûbûn. Lê Cem Özdemirê ku bi eslê xwe tirk e, da zanîn ew li hemberî vê guherînê ne. Özdemir diyar kir ku wê ev guherîn zirarê bide hemû biyanan. Mebûsê Keskan, gotinên Helmut Kohl ên bi rengê "Ev kes mafê mêvaniyê çewt bi kar tînin" jî rexne kir û got: "Însanên li Almanyayê bi cih bûne, êdî ne mêvan in." Özdemir diyar kir ku guherîna vê zagonê bi helwesta sosyal demokratan ve girêdayî ye.



## DIK

### Çeqçeqok û aştî...

Ku yek bi pirsa "Tu vî welatî bi tevayî dikarî bi gotinekê bidî naskirin?" ji min pirsekê bike, wê bersiva min ev be: Aş çûye, ketine pey çeqçeqokê.

Dema ku siyasetvanekî tirkan biaxive; jixwe ew riya gotinên rast nizanin, lê ku wê rojê xwe şaş bike û zimanê wî li gotinên rast biterpile û rastiyê jî bibêje, di vî welatî de (jina wî jî di nav de) kesekî ku jê bawer bike peyda nabe. Lê dema hilbijartinan hûn dibînin ku milet dîsa rayên xwe didine wan kesan .

Avakirina hikûmeta tirkan, ji zewaca li gundên kurdan a çil sal berê, xerabtir çêbû. Berê li gundên kurdan, qerara ku zewac bi kê re wê çêbe bav dida, ne zava. Mesut Yılmaz jî, bi Refahê re nîşanî kir, lê bavê wî roja dawetê peşk lê da û çû jê re jinebiyek anî. Yılmazê fiqare jî, ji jinebiya çilsale re dibêje: "Çi qîzeke rind e!" Li ber Erbakan û hemû milet, yekî ji Asilhan Oğuztürk re lûleya demançeyê direj kir, lê Erbakan dibêje "Na lawo, te şaş dît, camêr qevdek gul direjî te kir, ji te wer e ku demançe ye! Ha pere, here ji xwe re berçavikeke baş bikire!"

Jixwe hûn Reîsê komarê nas dikin: Do tav bû, îro ewr e, ma îro tava we hebû, min xwar?

Piştî kurdan, yên ku zilma mezin dîtine, sosyalîstên tirkan in. Lê wan jî (piraniya wan, lê ne tev) dev ji yên ku ev çend xwîna wan rêtine û direjin berdane, derd û kula wan a mezin, bûye paşverûtiya Refahê... Bi tirs û saw, wekî ku Ezraîl dabe devê derî, dibêjin "Refah tê îktidarê!"

Ev sê meh in ku PKK'ê agirbest îlan kiriye, lê ka wê di di nav vê tabloyê de bi kê re aştî çêke? Xwîn tê rêtin, hêstir dibarin, milet birçî ye, ji wan, re çi? Zikê wan têr in, zarokên wan ji şer dûr in... Û jixwe ji bo vî welatî heftê milyon însan zêde ye, milyonek-du milyon kêm bibe kar e, ne xesar e!

RAHMÎ BATUR

# 'Dilê wan goşt dixwaze, em biçin wehşan serjê bikin, bînin'

**Malbatên kurd li Stenbolê li lêzimên xwe geriyan. Wan ji dewletê, lêzimên xwe dixwestin, lewma hatin li ber deriyê Lîseya Galatasarayê rûniştin. Ew jî bes nedîtin, roja 25'ê adarê civînek çêkirin ji bo çapemeniyê, da ku dengê wan biçe dinyayê. Wan nedixwest êdî kes vê janê bikişîne. Her wiha wan tevî dîtina lêzimên xwe yên "windakirî", aştî jî dixwestin.**



**Malbatên kurd dibêjin: "Bila bes xwîn birijê û mirov bên windakirin."**

13 rojên wan qediyan winda kirin, ez çûm û hatim, go tunin, ez çûm û hatim, go tunin..." Ev peyvên jorê, pir hindik çîroka malbatên kesên ku bi destê dewletê hatine windakirin rave dikin.

Heftiya çûyî mêvanên rûniştgeha dayikên windayan, a li ber deriyê Lîseya Galatasarayê, ji welatê di bin rêveberiya ne-asayî de hatibûn. Piştî rûniştina xwe ya her hefteyê, ku roja şemiyê çêdibû, bi pêşengiya ÎHD'ya Stenbolê, civînek li Menzela Tabîbên Tirkiyeyê (TTO) li dar xistin.

Di civînê de 27 lêzimên kesên windakirî, çavdêriyên xwe, ango çîroka windabûna lêzimên xwe anîn zimen. Piraniya wan bi kurdî axivîn û çîroka wan kesên windakirî, gelekî dişibîn hev.

Hêzên dewletê li ber çavên mirovan, ji kolanan an jî di mal de li ber çavên wan, lêzimên wan biribûn û paşê jî "winda kiribûn." Hemû deriyên ku serî lê dane, hatine girtin. Wan hêviya xwe ji rayedarên dewletê birîne, lê ji lêzimên xwe nebirîne.

Dayik, bav, pîrek û xwişk û birayên kesên windabûyî ji dewletê lêzimên xwe dixwazin. Dayika Hamsa Çiçek a ku sê kurên wê Çayan Çiçek, Tahsin Çiçek û A.İhsan Çiçek hatine windakirin, dibêje: "Operasyon hate gund û her sê lawên min girtin ... ku miriye bila cenazê me bidin, ku zanin bila derxin. Heya ji me bê, ez serê xwe didime ser vê rê."

Muharrem û Mehmet Tanrıverdi, ji ber çavên dayika wan Kadriye, birine û winda kirine, ew jî zarokên xwe dixwaze, lê zindî: "...Ez cansız jî naxwazim, canli dixwazim zarokên xwe. Heta ez karibim, heta ruh di canê min de hebe, ezê li pey zarokên xwe bigerim... Ma ez ji bo termê mirî hatime wan deran?" Dibêje dayika Kardiye.

Dayika Kadriye li hemberî vê zilmê xwe ranagire û wiha dom dike: "Dawe ku, li min dike? Ji min re dibêje çi? Hela bila bêje? Heqaretî nîn e? Ku goştê wan xwariye, bila bêje min goştê wan xwariye. Ku dilê wan goşt dixwaze, em biçin keran jê re serjê kin, bînin; wehşan serjê kin bînin... heqaretî bes nîn e? "

Malbatên kurd ne tenê lêzimên xwe, aştiyê jî dixwazin. Wan jî fêhm kiriye ku heta ev şerê qirêj dewam bike, wê mirov bêne windakirin. Pîreka Sinan Fidan, Hüsmiye Fidan vê yekê dibêje: "Ev zilm û zor bila bê hilkirin, zarokên me sêwî dihêlin, em însan û ciwan in bes e êdî, em dawe aştiyê dikin."

Di destê wan de gelek delîl jî hene, lê çi feyde. Ku mirov here ji gur doza pez bike, wê karibe çi bi dest bixe?

Pîreka Ali Tekdağ, Hatice Tekdağ dibêje: "... Min di pey wî re du mehan dîlekçe dan. Polîsan em diqewirandin, ez derketim hinda başsawcî, başsawcî got, ji ku girtin, min go li ber deriyê Şekerbankê, got here şahidê xwe bîne, min go li ber min girtin, ez herim kê bînim..."


Pîreka Fehmi Tosun, Hanım Tosun ji ber ku plakaya erebeya ku pê mêrê wê revandine girtiye, ji aliyê polîsan ve tê tehdîtkirin. Dîsa bavê İbrahim Gündem ji ber ku navê Üsteğmen Kenan Şahin dide, jê tê xwestin ku îfadeya xwe biguherîne.

Dayik, bav, xwişk û birayên windayan rabûne ji Wanê, ji Amedê, ji Kerboranê hatine Stenbolê. Lê baweriya wan jî zêde bi çapemeniya tirk nayê. Lewma pîreka Ali Tekdağ, Hatice Tekdağ di encama civînê de got: "Em nehatine wir ku em wêneyên xwe bidin kişandin, heke hûnê cih bidinê, bikişînin." Dîsa birayê Rıdvan Karakoç, Hasan Karakoç rexne li çapemeniyê girtin.

Her wiha mirov ji gotinên pîreka Fehmi Tosun, Hanim Tosun fêhm dike ku malbatên kurd êdî ne tenê li xwe difikirin. Hanim Tosun çalakiya malbatan a her hefteyê bi bîr dixe û dide zanîn ku, ew naxwazin tu kes vê janê bikişîne, lewma vê çalakiyê pêk tînin.

SAMÎ BERBANG

# Dewr û daîma guran...



A. MELİK FIRAT

**Di navbeyna qanûn û hiqûqê de ferq heye; di hiqûqê de însaf, mesafet û heqaniyet heye. Di qanûnê de ev tune ye. Lê cumhûriyeta kemalîstan, qanûnên ku bi xwe jî çêdike, jê re rîayet nake. Elameteka wan a farîqe zilm e.. Edaleta xwe, bi lêxistin, kuştin û kutanê didine meşandin. Kî ku çavên xwe veke, qamçiyê wan li ser serê xwe dibîne...**

Ev sîstema bi navê cumhûriyetê, ev rejîma ku niha li Tirkiyeyê hikumferma ye, tiştekî xerîb e, li dinyayê emsaleke wî tune ye. Tabîreka tirkan ku dibêjinê"Qereqûşî" heye, en rind ev tabîr li rejîma tirkan tê.. Çer kêfa wî xwest, arzûya wî çer xwest, bi wî şeklî hereket dike. Bi xwe qanûnê datîne, lê rîayeta qanûnên xwe jî nake.

Gelek tîran, haqan, qral, padîşah û dîktatoran li dinyayê hikum kirine. Wan qanûn çêkirine, gotine hûn bixwazin jî ev e, hûn nexwazin jî...

Em bibêjin; merivekî ku bejna wî 85 santîm be, çavên wî şîn, porê wî zer be, wê ew meriv bê kuştin... Di vê qanûnê de hiqûq tune ye, zilm heye, ji ber ku dirêjahî û kinahiya bejna mirov, rengê por û çavên mirovan, ne li gorî xwesteka meriv çêdibe, ew ji mirov wêdetir e. Dîktator qanûnên wiha çêdikin û wan tetbîq dikin. Lê ev cumhûriyet, ev rejîma kemalîst wer nîn e; qanûnekê çêdike, bejna te heştê santîm be jî, te bi dar de dike, heftê santîm be jî, te bi dar de dike. Porê te, çavên te reş bin jî, te bi dar de dike. Rojekê dilê wî dixwaze çavşînan, dotira rojê dilê wî dixwaze, çavreşan bi dar de dike û dibêje: "Kêfa min wer xwest..." Yanê ne li gorî qanûn û hiqûqa xwe, li gorî kêfa xwe karê xwe dimeşîne.

Di navbeyna qanûn û hiqûqê de ferq heye; di huqûqê de însaf, mesafet û heqaniyet heye, di qanûnê de ev tune ye. Lê cumhûriyeta kemalîstan, qanûnên ku bi xwe jî çêdike, jê re rîayet nake. Elameteke wan a farîqe zilm e.. Edaleta xwe, bi lêxistin, kuştin û kutanê didine meşandin. Kî ku çavên xwe veke, qamçiyê wan li ser serê xwe dibîne...

Miletê tirk jî, ji tarixê ve wer elimandine, mesela; îro saziya (müesese) wan, a herî cidî eskeriye ye û kî here eskeriyê, li wir kunya wî "eşekoğlu eşek"e. Tu carî ji hev re bi milaîmî mûamele nakin, kî bi kê dikare li nav çavên wî dide û dibêje: "Eşekoğlu eşek!" Yên ku bi dûvdirêjî eskerî kirine, di nav wê sîstemê de bûne general jî, wexta ku li cihekê tên ba hev, heya ji hev û du re nebêjin "eşekoğlu eşek!" jî rihet nabin. Ev ji wan re bûye tiştekî tabîî...

Yanê aqil û mantiqê vê rejîmê, ji bo îqnakirinê, ji şûr, rim, dar, çek û zorê nabihûre...

Xusûsiyeteke wan jî talen e. Çi malên ku aîdê xelkê be, yên umûmî be, yên dewletê be, dikin bin emrê xwe, ji malên xwe bêhtir wî ji xwe re dihesibînin. Eger ew xelas kirin, malê destê milet jî, ji destê wan didizin. Îro xwe hinekî li gorî esrê (sedsalê) guherandine. Berê bi esker û bi zor distendin, vê gavê butçe çêkirine, rûniştine buroyên xwe û ji xelkê pere top dikin, didine mirovên xwe....

### Meslekê wan ê mezin jî derew in...

Di warê derewan de, qabiliyeteke wan a pir muhîm heye. Dema dixwazin, kes bi qasî wan xweş napeyive. Wexta ku tu li wan guhdarî dikî, tu wê bibêjî jî wan adîl, ji wan medenî û ji wan dilovantir (birehim) kes tune ye. Lakîn ev gotinên wan giş derew in. Kirin û gotinên wan paşpê hev in. Wexta ku dibêjin emê welat ava bikin; xera dikin, dişewitînin..

Dema ku bibêjin emê sîstema miarîfê, sîstema xwendinê bi pêş ve bibin; çiqas tiştên cahîlane, tiştên ku aqil qebûl nake, yanê ilefîsên wan, çiqas sloganên wan ên paşverû hene, wan bi kar tînin.

Ji ber vê yekê jî, yê ku di nav sîstema vê rejîmê de mezin bûye, xwe ewladê vê rejîmê dihesibîne, ku çi bibêje, çi qise bike, divê em qet îtibara xwe pê neynin, pê bawer nekin. Derewkirin ji bo wan tiştekî tebîî ye. Yanê, çawan ku nan û av û hewa tiştekî tebîî ye, derew jî gidaya wan e. Û ji derewan şerm nakin, derewan meziyet dizanin. Bi xapandina milet, xwe serbilind, bextiyar dibînin...

Reîsêcumhûrê tirkan Süleyman Demirel, deh sal ji heqê xwe yê siyasetê hat dûrxistin. Wê demê digot: "Darbecî xelet dikin, welat bi paş ve dibin. Eskeran çi ji me xwest û me neda? Çima darbe çêdikin? Ev anayasa (qanûna bingehîn) wan antî–demokratîk e..."

Li temamî welat geriya û got. Lê îro ev anayasaya ku Evren çêkiriye, weka Încîl, weka Tewrat û weka Quranekê di cêba xwe de vedişêre. Li hafa milet derdixe bêşerm û fedî maçî dike, dide eniya xwe û dibêje: "Ez bekçiyê vê anayasayê me!" Ji Evren re dibêje: "Tu li ber behrê ji xwe re resim çêbike, li kêf û zewqa xwe binêhêre, ez li vir anayasaya te mûhafeze dikim."

### Li dinyayê merivekî wiha, sîstemeke wiha tune ye

Îcar miletê tirk jî elimiye, ji vê nerihet nabe. Yanê kî jê re derewan bike, ew jî jê re li çepikan dixe. Vê gavê nan sêzdeh hezar e, bibe sîh hezar jî qet kes nabêje çima? Di nava vê sîstemê de her kes li pey xapandina yekî din e... Em bibêjin yên ku hatineke wî ya mûayên heye, qezenceke wî yê mûayen heye, ancax xwe îdare bike, wexta ku tiştên wî yên heyatî biha bûn, gerek e rabe ji dewleta xwe re bibêje: "Ez nikarim îdare bikim, tu çima wer dikî!" Lê tişteke wisa tune ye. Çimkî milet wer kirine; dibêjin hev bixapînin, bidizin. Dibêjin mêze bikin; em çer didizin... Reîsê beriya vî Silêmanî jî got: "Memûrên min îşê xwe dizanin." Yanê tê wê maneyê ku miaşê we têr nekir, miaşê we kafî nebû, bidizin... Û ji yên ku li ortê reben û belengaz mane re jî, dibêjin: "Bila canê wî jî here cehenemê, ji we re çi!.."

### Ev sîstem, sîstema kê kî xapandinê ye

Dewr û daîmek çêkirine, li dora hev digerin, mîna guran, kî bikeve erdê wî dixwin...

Siyonîzm quweteke mezin e li dinyayê, li dinyayê hikum dike û karê lobiya tirkan siyonîzm dimeşîne; dibêjin me di Herba Alemê ya Yekemîn de bi wasiteya emperyalîstên îngilîzan, hem saltanet û xîlafet hilşand û hem jî sîstema vî erdê ku hezar salî bû, me serûbin kir. Yanê sîstema wî ya hiqûq, siyaset û ekonomiyê me vajî kir. Me xençerek li orta qelbê alema îslamê xistiye, ev xençer bila di wir de bimîne. Bi ewrûpiyan re dema tu qise dikî, ha bi alelade, ha jî bi zanayên wan re; ew jî dibêjin ev rejîma Tirkiyeyê ku dibêjin em rojavayî ne, derew e. Tu eleqeya wê bi me ve tune ye. Lê kêfa wan jî bi vî tê, dibêjin hemin wan xwe wiha qeşmer kirine, mesqere kirine, ji bo me çêtir e, rind e...

Ev ji patronên xwe yên Ewrûpayê bêhtir mûteasib in. Mesela; patronên wan ên ewrûpî dibêjin êdî dinya gilover (global) bûye, her kes zimanê xwe, baweriya xwe (bi dil nebe jî, bi zahirî jî be) divê bikaribe biparêze. Lakîn ev mûqelide yên ku di vir de ne, mîna meymûnan, merivan diperitînin. Ji devê te gotinek derkeve, hema hilbaskê te dibin, te diperitînin. Yanê mesqere ne, bi van şebekeyan jî, tişt naçine serî.

### Divê sîstem were guherandin

Em dibêjin, madem ku hûn dibêjin 'batı', hûn dibêjin rojava, werin sextekariyê nekin, sîstema xerbî bînin. Bila li vî welatî sîstema demokrasiyê, sîstema hiqûqê hebe. Hiqûqa beynelmînel, hiqûqa cîhanî bînin. Bila însan fikrên xwe, baweriyên xwe bibêjin, kultura xwe, bikaribin biparêzin Îro di cihên wan de îngilîz û fransiz bûna, ev welat heftê sal mûstemlekeya wan bûya, ji sedî yekê van nedikirin. Ne ji boyê kurdan tenê, ji bo miletê xwe jî were ne. Di vê demokrasiya wan a xerabêt de, di nezera dewletê, di nezera burokrasiya tirkan de, gel mîna ehlê mûstemlekê ye. Belkî neyê bîra xortan, ji vir 50–60 sal berê, ehlê burokrasiya tirkan, ên li pêş digotin: "Wê çawa raya me û raya Hesen û Hiso bibe yek!" Wer digotin, îstîza dikirin... Ev dibêjin em zana ne, lê miletê me cahil e, nezan e. Tekerlema "Halk fıkrası" ev bû: "Halka rağmen halk için." Yanê xelk nezan e, ew qebûl nekin jî, ji dêla wan, em tiştên rind dizanin. Û ji gel re dibêjin tu wiha bike! Wiha rûnê, vî libasî li xwe bike, vê şewqeyê bide serê xwe, piyanî mîz bike! Elametê medeniyeta wan jî ev e: Ku tu rûniştî mîz bikî eyb e, ku tu piyanî mîz bikî, tu dibî modern!

Karên wan qeşmerî ye, ji heyata modern tu tiştî negirtine, ne senat (huner) û ne jî tiştên teknîkî girtine. Tim tiştên mûptezel, tiştên aîdî seksolojiyê, di qanalîzasyonê de çi hebe, di vir de bi pêş ketine. Bi çend rojan berê, di rojnameyekê de min dît; hinek meriv digotin em di saha lîstika qumarê de li dinyayê yekemîn in. Rast e, di vê sahayê de yekemîn in. Lê di saha ilm û marîfet û kulturê de jî sifir in...

Van rojan nas û dost dipirsin: "Mesut Yılmaz, baş xeber dide, tiştên xweş dibêje, baş e, wê bikaribe gotinên xwe bi cih bîne?"

Niha Mesut Yılmaz û Tansu Çiller dibêjin: "Me Anayol çêkir, çi rind e." Lê temamê Tirkiyeyê dizane ku, ji hev û din re çer dijûn dabûn. Li ber çavên temamî dinyayê ew bi zor anîn ba hev. Û şerm û fedî nakin, dibêjin: "Ev hikûmeta me ya Anayolê çi rind çêbû!"

Merivekî ku wiha li ber çavan, bi vî rengî derewan bike, wê meriv çer jê bawer bike?..

Ew kesê ku di vê sîstemê de gihiştî be, ji vê fabrîkeyê derketî be, lazim e mirov li wî û li gotinên wî zû bi zû bawer neke. Bi serê xwe jî nîn in, li ser serê wan çend bend hene. Mîna qûqle bi bend in û meriv nizane quwet di kîjan bendî de ye. Bendeke wan MGK

ye, yek Ewrûpa ye, yek Amerîkaye, yek jî di destê van dizên mezin de ye.. Îcar kêfa kî dixwaze ew bendê ber bi xwe ve kaş dike. Ji ber vê jî, carinan serokweziriên wan aciz dibin, dibêjin: "Eh! Ev bend di destê kîjan bênamûsî de ye?!." Û xwe didin aliyekî, diçin.

Ji ber ku ev dewlet li tu qerarên xwe, li tu qanûnên xwe xwedî dernakeve, mirov di hediseyan de bi awayê qanûna siyasî, bi awayê qanûna îçtîmaî (sosyal) nikare bigihîje qerarekê. Qaîde nîn e. Dibêjin, lê xwe nadin aliyekî, naçin.


Gotineke tirkan heye, dibêjin "Zurna da peşrev olmaz, ne çıkarsa bahtina." Çi zirnevan be, çi kemanvan be û çi bilûrvan be, xweş li aletan dixin, lê yên govendê digerînin, ne li gorî hewayê mûzîkê dileyîzin. Tirkiye jî ev e.. Heta ku sîstem neyê guhartin, tu tişt safî nabe, çareser nabe.

Dîsa gotineka tirkan hey e: "Lawik pir meqbûl e, mezbût e, lakîn cînar pûştin!."

Raste ku Mesut Yılmaz merivekî derewîn nîn be, bi texmîna min merivekî diz jî nîn e. Dibe ku dilê wî bixwaze ji bo wan tiştên ku dibêje, bike û îcabên gotinên xwe bi cih bîne. Lê nikare bike, ji ber ku di destê wî de tiştek tune ye. Tevger û şertên Tirkiyeyê ev e. Yılmazê reben wê çer bike, ji kê destûr digire, kî destûr didê, nadê; mirov nizane... Ji ber ku miriv nizane jî, divê meriv bawer neke.

# Hezar çavşîn e

*Tîrêjên hîvê ketine ser Hezarê*
*Bêsebir û bêhizûr*
*Hezar, di bêrîka xwe ya germ de*
*Vedişêre mêvanê xwe*
*Zarokekî di nozdeh saliya xwe de*
*dil rûbara evînê*
*Na hevalê çavşîn na!*
*Ev ne dilê dayika te ya bi qîr*
*û girîn e*
*Ev ava hezara tarî û sarî ne*
*Na hevalê min na, na kurê min na*
*Çavên te wekî şûrekî tûj, dibiriqin*
*Di tariya zilma xwînê û di tîrêjên*
*hîvê de*
*Lê tîrêjên hîvê xwîna porê*
*te nabin*
*Na hevalê çavşîn na*
*Tenê ava Hezarê ya şîn dikare*
*dest bide porê te*
*Tîrêjên rojê li ser Hezarê*
*Bi stêrkên berbangê ve*
*Bi hezar rengî ketine govendê*
*Şîn dibe bi hezar rengî Hezar*
*Careke din û ji nû ve.*
*Lê dayika te êdî serê xwe*
*natewîne*
*Û destê xwe şidandiye*
*Û dest wekî xwînê*
*Û dil wekî xwînê*
*Roj wekî xwînê*
*Tolhildana hezar salan êdî îsal e*
*Êdî îro ye û êdî niha ye*
*Û niha berbanga şefeqê*
*Dikeve silavê li ber dengê roketê*
*Û niha zarokên nozdeh salî*
*Gav bi gav neqiş dikin welatê*
*rojê*
*Û niha hevalên çavşîn keda xwe*
*dirijînin ser axa sar*
*Û niha zarokên nozdeh salî û*
*çavşîn*
*Xwîna xwe dirijînin ser ava sar*
*ya Hezarê*
*Li welatê me*
*Dayik kurê xwe dipêçînin*
*Di panzdeh salî ya wan de*
*Li welatê me*
*Dayik kurê xwe dişînin şer*
*Di panzdeh salî ya wan de*
*Û li welatê me*
*Dayik kurê xwe berdidin Hezarê*
*Di panzdeh salî ya wan de*
*Zarokên panzdeh salî û rûyên*
*bihêvî*
*Zarokên panzdeh salî, panzdeh*
*salî ku mane sêwî!*
*Û dayik careke din hembêz dikin*
*zarokên panzdeh salî û çavşînên*
*nozdeh salî*
*Ên ku diçin bi Hezarê re*
*Ên ku tên, hembêza çiya*
*vekiriye ji wan re*



## Mehmet Şen
## (Necip)
## 26.03.1994


*Şehadeta we, talîmata bi serketinê ye*
*Hesiyeta we, têgihîştina jînê ye*
*Sozê we, şerefa me, namûsa me û*
*sonda me ye*
*An azadî! An azadî*

Di salvegera duyemîn a şehadeta te de ez hemû şehîdên azadiyê di şexsê te de bi bîr tînim û girêdana bi wan re, wekî sedemê jiyanê qebûl dikim.

**NURAY ŞEN**

# Lenet li wan be ku bi navê îslamê nîjadperestiyê dikin

MEHMET METİNER



Çend roj berê, di demeke şevê de, gava ku min di navbera kanalên televîzyonên tirkan de zapîng dikir, ez çi bibînim, di Kanal E'yê de programeke munaqeşeyî li ser "Mafên Mirovan û Demokrasî"yê hebû. Kesekî, bi navê Doç. Dr. Zekeriya Beyaz navê îslamiyetê bi kar dianî û nasnameya kurdan înkar dikir. Zekeriya Beyaz, mirovekî wisan e ku, neteweperestiya tirk ji xwe re kiriye al. Wî tehsîla medreseyê dîtiye. Demekê muftîtiyê jî kiriye. Ji xoceyên dîn ên Alparslan Türkeş e. Di Rojnameya Ortadoğuyê de nivîskariyê dike, ku ew organa weşanê ya MHP'ê ye.

Bi Zekeriya Beyaz re, berê em di prgrameke televîzyonê de hatibûn cem hev. Ew bi xwe, di nav hewldaneke wisa de ye, ku dixwaze fikrên xwe yên nîjadperest û şoven bi navê îslamê pêşkêş bike. Ji ber vê yekê, ji yekî wekî min î ku hem bi dînê xwe ve girêdahî ye û hem jî nasnameya xwe ya kurdî diparêze, qet hez nake.

Zekeriya Beyaz, gava ku di programê de nasnameya kurdî hate rojevê tişt: "Li Tirkiyeyê kurd hene. Ew birayên me ne. Lê ew jî tirk in. Jixwe di madeya 66'an a qanûna me ya bingehîn de, tê eşkerekirin ku, her kesên li Tirkiyeyê dijîn, tirk in. Di vir de maneya tirk, pirtir, di maneya çandê de ye." Birêz Beyaz gote ku, kesê bibêje li Tirkiyeyê "Pirsgirêka kurdan" heye ew "neyarên dewletê" û "cudaxwaz"in û ew bi fendên PKK'ê xapiyane. Di vê navê de jî têr û têr ji îslamiyetê behs kir. Biratiya îslamî û yekîtî û bihevrebûna gel jî anî zimên. Her wiha wî, Serokê Komeleya Mafên Mirovan ê Şaxa Stenbolê (İHD) Ercan Kanar, wekî piştevanê PKK'ê sûcdar kir, çima ku wî PKK protesto nekir.

Uslûba Beyaz îxbarkar û sûcdarkar bû.

Min xwe ranegirt û min dest avête telefonê û min hin pirs arasteyî birêz Beyaz kirin. Her hebin, rayedarên Kanal E'yê ev îmkan dan min. Lê ji ber ku ez gihiyabûn dawiya programê pir kêm wext dane min. Ez dixwazim, wan pirsên ku min arasteyî birêz Beyaz kiribûn, pêşkêşî we jî bikim.

Gava ku birêz navê min bihîst, di bin simbêlan re bişirî. Min got ku, uslûba wî ya îxbarkar û sûcdarkar bi uslûba zanyarekî/ê nakeve û ez beşdarî axaftina wî ya ku li ser navê îslamê dike, nabim. Û min tavilê ev pirs arasteyî wî kirin. Gelo çima dema ku peyva kurd tê holê, birêz Beyaz dikeve nav hewlên ku kurdan dikine tirk? Bi ya min ev nêzîkahîtêdaneke nîjadperestî ye. Ku îslam nîjadperestiyê red dike. Birêz Beyaz, ku li ser navê dîn dipeyive, gelo dikare bibêje li gorî kîjan çavkaniyên îslamî gotinan serf dike? Bi qasî ku ez wî nas dikim, birêz Beyaz nîjadperestekî tirk î tund e. Ew bi xwe neteweperestiyê, li gorî dîn rewa (meşrû) dibîne. Ez jê dipirsim, birêz Beyaz, ê ku neteweperestiya tirk rewa dibîne çima li hemberî neteweperestiya kesên din derdikeve? Madem neteweperestî ne baş e, çima ew bi xwe vê yekê dike?

Birêz Beyaz, got ku kurdên li Tirkiyeyê dijîn, ji aliyê çandî ve tirk in. Ev yek jî li gorî madeya 66'an a Qanûna Bingehîn eşkere kir. Em ferz bikin, li Kurdistana Iraqê dewleteke kurdan bê avakirin û ev dewleta kurd, di qanûna xwe ya bingehîn, di madeya 66'an de binivîse, "her kesê ku li Kurdistanê dijî kurd e", gelo wê çaxê tirk an jî tirkman tev dibine kurd?

Hûn dizanin Zekeriya Beyaz çi kir? Ji dêla ku bersivan bide wan pirsên min, serî li riyên çivandinê da. Gote ku di îslamiyetê de neteweperestî rewa tê dîtin. Diyar kir ku, ramanên ji bo bilindbûna neteweyekê û xebat û hezkirina jê, ne nîjadperestî ye. Lê negot ka ji bo çi li dijî neteweperestiya kesên din e. Neda nîşan ku, ka li gorî kîjan çavkaniyên îslamê kurd "tirk" in. Ji pirsa min re, ya "Sibê roj dewleta kurdan çêbibe û di qanûna bingehîn de bibêje her kes kurd e", bersiva "Ez naxwazim li ser îhtimalan bipeyivim", da. Û xwe çivçivand.

Ew kesên ku li ser navê îslamê neteweperestiyê rewa dibînin, îslamê lekedar dikin. Îslam, dînê hemû nîjadan (irqan) e. Li gorî îslamê tu nîjad ne raserî nîjadeke din e.

Ew, ji biratiya îslamî tenê vê fêm dikin: Bi her kesê pejirandina raseriya nîjada tirk.

Biratiya îslamî, navê daxwaza bihevretiya nîjadan a wekhev e. Ew kesên ku ji peyva kurd re tehemûl nakin, nikarin ji biratiya îslamî behs bikin.

Xwedê leneta xwe li wan kesan bike ku, li ser navê îslamê nîjadperestiyê dikin û wan ramanên xwe yên nîjadperest di bin perdeya îslamê de pêşkêş dikin.

www.arsivakurdi.org

# Cil û bergên dora Mûşê



**Li ser cil û bergan taybetiyên mîtolojîk jî têne dîtin. Rojnamevan M. Erdoğan dêhnê dikişîne ser vê yekê û wiha dibêje: "Kurd ji keskesorê re 'bûka baranê' dibêjin û sedema rengînbûna cil û bergên jinên kurdan, ji vê yekê diqewime." Heft rengên di keskesorê de xwedî teybetiyên dîrokî û mîtolojîk in. Di gel vê yekê, rengê sor, di cil û bergên kurdan de rengekî sereke ye,**

Çand, bi hebûna mirovan re çêbûye û di destpêkê de jî şêwegirtina wê, ji ber xwe ve qewimiye. Ji ber nebûna zimanê axaftinê û nebûna nivîsê, mirovan pêşî bi zimanê bedenê ji hev fêm kirine. Ango bi îşaretan. Di vê demê de teqlîd di rewacê de ye. Bi vî awayî mirov ji hev fêm kirine. Bi peydebûna resim û nivîsê, ku êdî hem zimanê axaftinê û hem jî zimanê nivîskî derketiye holê, şekilgirtina çandê jî bi lez û bez çêbûye.

Lê, gava em li vê demê binihêrin, em nikarin rastî cil û bergan (kostûman) bên. Bi pêşveçûna mirovan re, di warê cil û bergan de, di warê xeml û xêzan de jî peresandinek rûdide. Di serî de mirov, xwe bi pelên mezin û fireh dinixumînin. Li hin deveran bi tenê ji navê berjêr, li hin deveran jî, tevî derên ji navê berjêrtir, pêsîrên xwe jî dinixumînin.

Bi qonaxa demê û bi pêşveçûna hacet û alavên hilberînê re, di warê cil û bergan de jî, cudatî xwe didine hesandin. Di dema nêçîrvaniyê de, mirovan ji bilî goştê heywanan, ji post û çermên wan jî îstifade kirine û ji wan, ji xwe re cil û berg çêkirine.

Di pey qewmînên di warê raçandin û pîşeyan de, bi destpêkirina şer û cengan, bi peydabûna çînan (sinifan) di civakê de, bi derketina ji dema pirxwedatiyê û ketina dema yekxwedatiyê, bi pêşveçûna senayiyê re, di warê cil û bergan de, di warê xeml û xêzan de jî guherîn çêbûn.

Di vê navê de, bandorên herî xuya yên li ser şêwedayîna cil û bergan ol, mercên cografîk û endîşeyên estetîkî ne. Dema em bala xwe bidine cil û bergên kurdan, em bi hêsanî wan qonaxan dikarin bibînin. Her wiha, dema em li heykel û rolyefên ku ji şaristaniya Mezopotamyayê mane jî (ji sedsalên XXI û IX'an ên beriya zayîna Îsa) dinêrin, em vê rewşê dibînin.

Li ser cil û bergan taybetiyên mîtolojîk jî têne dîtin. Rojnamevan M. Erdoğan dêhnê dikişîne ser vê yekê û wiha dibêje: "Kurd ji keskesorê re 'bûka baranê' dibêjin û sedema rengînbûna cil û bergên jinên kurdan, ji vê yekê diqewime."

Heft rengên di keskesorê de xwedî taybetiyên dîrokî û mîtolojîk in. Di gel vê yekê bi ya me sebebê ku rengê sor di cil û bergên kurdan de rengekî sereke ye jî ev e: Ji ber ku gelê kurd beriya îslamiyetê, di dema pirxwedatiyê de "agirperest" bûye û rengê sor jî şibandine agir, lewma. Her wiha rengê sor wekî sembola duristî û safbûnê jî hatiye pejirandin. Îro jî rengê sor û kurd bêyî hev nayên fikirîn. Ev gotina pêşiyan "Bila sor be, bila pênc qiruşên wî zêde bin" jî îspata vê yekê ye.

Çawa me got ku tesîra dîn li ser cil û bergan heye, her wisa ya cografîk û îklîmê jî heye. Cil û bergên herêmên çiyayîn û sar, ji çol û cawên qalind hatine çêkirin; mirovên wê herêmê jî cilên teng li xwe dikin. Li deştê û deverê ku hilberîn lê bi pêş ve çûye jî, cil û berg hem tenik in û hem jî mirovên wan kincên fireh li xwe dikin. Jinên ku rewşa wan a aborî xweş e, bi gelemperî zêr û ziber û xişrên wan, zêr û zîv in. Jinên din jî morîk û zîv bi xwe ve kirine. Ev, bi gerdan, kofî û newqê ve têne kirin.

Piştî van agahiyan, îcar em dixwazin di vê xebata xwe de, li ser cil û berg û xemlên jin û mêrên dora Mûşê rawestin.

## Celebên wergirtinê

**Girêdana serî ya keçikan**: Li herêma me, girêdana serî ya keçikan xwediyê gelek celeban e. Ev jî, ji cudahiya mezheban tên. Keçikên ku porên wan dirêj in, porên xwe dihonin û dikine nêzîkî 20 kezî û wan bi benikên rengereng girê didin. Pişt re kofî didine serê xwe. Gulik pê ve têne kirin. Di pey de, nêzîkî heft pûşiyan, ku her yek ji rengekî ye, li dora kofiyê tên girêdan.

Di warê girêdanê de, keçikên ku ji mezhebên şafiî ne, goftik (girêk) diavêjine pûşiyan ku dikevin rast û çepê eniyê. Keçikê ku ji mezhebê alewî ne, bi tenê goftikekê diavêjine pêşeniya xwe. Bi gelemperî, piştî girêdana kofiyê, lêçekek an jî pûşiyek bi ser serê xwe de nakin. Gava keçik dizewicin, îcar pûşiyek an jî lêçekeke spî diavêjine ser serê xwe. Her wiha pereyê zîv, kevirên hêja û xişir bi dora kofiyê ve têne kirin.

**Girêdana serî ya jinan:** Piştî ku keçik dizewicin jî, kofiyê didine serên xwe. Heft pûşiyên rengîn, li ser hev tên danîn û li dora kofiyê tên girêdan. Girêkê jî diavêjin peşiyê. Çawa cudahiya girêdana pûşiyê di navbera keçikên şafiî û alewî de hebû, her wisa di navbera jinan de jî heye. Gava ku jinên ji mezhebên alewî pûşî girê didin, kofiyê diavêjin pêşeniya xwe. Her wiha kofiya wan mezin û bilind e. Li ser serî tîk disekine. Jinên ji mezhebên şafiî jî goftikê diavejin rast û çepên eniya xwe. Kofiya wan hinekî biçûk e. Kofiya xwe jî an bi aliyê rastê an jî, bi aliyê çepê ve xwar dikin. Her du hêl jî, lêçekeke spî an jî, pûşiyekê diavêjine ser kofiyên xwe. Pişt re jî

## BÛYERÎN JI DÎROKÊ



**● 31 adar: Roja Bîranîna Şehîdên Kurdistanê**

Di meha adarê de kesên wekî Mazlum Doğan, Mahsum Korkmaz, Zekiye Alkan, Rahşan Demirel, Qazî Mihemed, Ronahî, Bêrîvan şehîd bûne. Û gelekên bênav di oxira doza pîroz de serî danîn. Armanca tevan jî yek bû: Kurdistaneke serbixwe û azad.

**● 6 adar 1963**

Kovara bi navê Keko hate weşanadin. Ev kovar bi pêşkêşiya Ahas Îzol û xwendevanên Siwêregî yên ku li Zanîngehên Enqereyê dixwendin hate weşandin. Di sala 1965'an de jî, dîsa Abas Îzol bi xwendevanan re di kovara Kormişkan de cih digire.

**● 4 avrêl 1993**

Hêzên dewletê li Cizîrê, li hemberî gerîlayên PKK'ê, serê sibehê êrîşek pêk anîn. Zarokek û sê kes ji aliyê hêzên dewletê ve hatin kuştin. Di vê êrîşê de hêzên dewletê, du roket jî aavêtin ser Buroya Rojnameya Özgür Gündemê.

**● 5 avrêl 1994**

Hikûmeta Tirkiyeyê qerareke bi navê 5'ê avrêlê hilda. Ev qerar, ji bo ku dewleta tirk li Kurdistanê şer bidomîne hate standin. Di nava heftiyekê de enflasyon % 80 bû % 150. Dolarekî Amerîkayê ji 14 hezaran derkete 30 hezarî. Bi hezaran kes ji ber wî qerarî, îflas kirin.

# AWIR



**Di warê girêdanê de, keçikên ku ji mezhebên şafiî ne, goftik (girêk) diavêjine pûşiyan ku dikeve rast û çepên eniyê. Keçikê ku ji mezhebê alewî ne, bi tenê goftikekê diavêjine pêşeniya xwe. Bi gelemperî, piştî girêdana kofiyê, lêçekek an jî pûşiyek bi ser serê xwe de nakin.**

pûşiyeke din li dorê dipêçin û ji paş ve tê girêdan. Wekî din jî, jin serê xwe bi egal an jî kefiyê dinixumînin.

### Zêr û ziber

Li serî kofî û li ser wê jî taca zîvîn heye. Kofî bi xişirên cihê cihê tê xemilandin. Zêr û zîv bi benan ve tên kirin û bi dora kofiyê ve tê danîn. Morîkên rengîn jî pê ve tên kirin. Ev hemû bi pêşiya kofiyê ve tên kirin. Her wiha bi rast û çepê kofiyê ve jî, şirîtên zîv an jî zêran tên kirin.

Jin rûyên xwe ji dideqînin û xizmeyê bi pozê xwe ve datînin. Morîkên ji her celebî û rengîn dikine stûyê xwe. Zêran jî bi eynî awayî dikine stûye xwe. Bazinên zîv, morîkên rengîn dikin zendên xwe. Zîv, zêr û pûlan bi guhên xwe ve dikin. Xalxalan jî dikine piyên xwe. Li herêmê morîkên ji rengên sor, şîn, reş bi giştî tên hezkirin. Pîr ciwan tev, wan bi xwe ve dikin.

### Wergirtina kincan

Fîstan; ji qutnî û qumaşên din têne çêkirin. Gava ku fîstan tê wergirtin, li binî derlingeke ku devzendikên wê bi bişkok in, li xwe tê kirin. Pişt re jî binkiraskek tê wergirtin. Milên binkirask dirêj û bi bend in. Dirêjahiya wî jî, li gorî jinên ji mezhebên şafiî û alewî diguhere. Ên şafiiiyan, dirêjahiya wî li biniya çokê ye, yên alewiyan li seriya çokê ye. Di ser wî de îcar fîstan, tê wergirtin. Du parçeyên fîstan, ku sê tew in, yên li pêş, ji paş ve li navê tên girêdan. Bi gelemperî jî li herêmê jinên navsere vî fîstanî li xwe dikin. Wekî din, hin jin pêşmalê jî didine ber xwe. Zendikan bi milan ve datînin. Goreyên rengîn dikine piyên xwe. Her wisa, goreyên sade jî tên bikaranîn. Di pey de jî carik û harik (gorûk) tên wergirtin.

### Fîstanê pêşîvekirî û yê dûz

Kesên ku fîstanê pêşiya wî vekirî li xwe dikin, di binî de jî derlingê ku devzendikên wê bi bişkok an jî bi bend in, werdigirin. Di bin de jî binkiraskekî sade an jî bi şelk û reng li xwe dikin. Bi ser binkirask de jî fîstanê pêşîvekirî ñ bi ser wî de jî fîstanekî dûz û ku pêşiya wî bi xeml e, li xwe dikin. Piştî ku fîstan tê wergirtin, dawa wî tê berhevkirin û li navê tê pêçandin, her wiha dixine ber qûşaxê jî. Awayên din ên wergirtinê jî hene.

### Newq

Li navê kemberên zîv, qûşaxên ji rîs û yên din, tên girêdan. Heke ev qûşax mezin be, li herêmê ji wan re "pişt" tê gotin.


Kesê ku bixwaze, bi ser fîstan de cepken (mîntan) jî li xwe dike. Milên cepken dirêj û kêlek û pişt jî xercekirî ne. Pişt re jî sîngpêşî ku li herêmê navdar e, tê wergirtin. Her du serê jêr jî, li navê (newqê) tên girêdan. Her du serê din jî, li pişt stû tên girêdan. Sedemê ku sîngpêşî tê wergirtin ev e: Ji bo ku bersîng qirêjî nebe. Ji hêla din ve, ji bo ku dawa fîstan û mil qirêjî nebin, pêşmal û zendik jî tên wergirtin.

Li herêmê keç fîstanên ku pêşiya wan bi xeml û dûz e, ne vekirî ye, li xwe dikin. Fîstanên ku pêşiya wan vekirî ne, jinên navsere werdigirin.

XELEF ZINARÎN
Wergera ji tirkî:
ZANA FARQÎNÎ
***Dûmahîk heye***

# ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YIĞIT



## Hefteya Lehengên Kurdistanê

Hefteya Lehengên Kurdistanê, ji 21'ê adarê dest pê dike û heta bi 28'ê meha adarê dewam dike. Roja 21'ê adarê roja şehîdbûna Mazlum Doğan û 28'ê adarê jî ya Mahsum Korkmaz (Egît) e.Lehengî, mêrxasiyeke mezin û dîrokî ye. Broşûreke têkoşerê bêtirs Apê Osman Sebrî heye navê wê "Çar leheng" e. Gişt xwendevanên Azadiya Welat nebin jî, beşek ji wan ev broşûr xwendine an jî navê wê bihîstine. Lehengên me îro ne çar kes in, bi sedan in. Yeko yeko hejmartina wan, rêzkirin û nasandina wan mijara nivîseke wiha kurt e. Di nav erkên rewşenbîrên Kurdistanê de berzkirin, nasandin û popûlerkirina lehengên Kurdistanê jî, erkeke sereke ye.

Welatê me bûye warê şehîdan. Li her parçeyê Kurdistanê roja me bêşehîd derbas nabe. Her şehîd lehengek e û her leheng jî, mêjî û dilê me ye. Dilê me di şehîdbûna lehengên me de lê dide û lehengên me ji bo me bûne can, xwîn û dermana jiyanê. Şehîd û lehegên me damarên jiyana me, pencereyên ronahiya me û çaviyên bêhn û nefesa me ne. Em muqawemet û berxwedana xwe, hêz û kaniya israra xwe û teqet û qiramên çokên xwe, ji şehîd û lehengên xwe digirin û ew in yên ku ji bo me dibin bask, mertal û çeper û me ji tunebûn û windabûnê diparêzin.

Leheng û şehîdên me mêrxastirîn û fedekartirîn law û keçên gelê me ne. Baştirîn dirûv û nîşanên neteweya kurd di şexsiyeta şehîdên Kurdistanê de bi laş û gewde bûne.

Gava ku em çavekî biavêjin dîrok û derbasbûna xwe, em dibînin ku em pir ketine û rabûne, em di nav ketin û rabûnê de hatine heta bi îro. Serpêhatî û boblatên têne serê me, êrîşên berê wan li me, hezar dewletên dijmin ku 24 saetan agir li me dibarînin û bi kurtî rewşa gelê me ku tê de ye, ji çu neteweyên din re li cîhanê nebûye nesîb.

Bindestiya neteweya me û pirsa kurd û Kurdistanê, orîjînal û bêmînak e. Ev orîjînalîte û bêmînakî bi xwe re hewcedariyên xweser hildigire û barê şoreşger û rewşenbîrên welatê me bêpîvan giran dike. Mal, dewlemendî û namûsa me li ber talanê ye. Em rût û tazî hatine hiştin. Destên zalim û çavsoran di qirika me de ne. Ne carekê, belê bi dehan car em ketine ber sikratan û em ji qeraxa geliyê mirinê vegeriyane.

Parçebûnên Kurdistanê, perçiqandinên serhildanên Kurdistanê, şikestinên serokatiyên Şêx Seîd, Îhsan Nûrî Paşa, Seyîd Riza, Qazî Mihemed û Berzanî, hatine rejîma 12'ê rezberê (îlonê) û rewşa paş Qetlîama Helebçeyê çend bêhnikên nefesbir û bêhnçikên in, ku ruhsitên berdane pêxêra me û şîrê heftrojî di pozên me re daye avêtin. Belê ev qas tişt û felaket hatine serê me û heger bi ser vî qasî de, em îro li ser lingên xwe mane, me çokên xwe nedane erdê û di nav gelên Rojhilata Navîn de em bûne sidyanê hesinî, ev ne kerametek e gelo?

Na, ev ne karê keramet û mucîzeyan e. Keramet û mucîze ji kesî re ew qas xizmetê nakin. Kerameta mezin, berxwedana gelê me û awe û şêweyê şehîdbûna şehîdên me, qerardarî û nedudiliya lehengên welatê me ye. Bêgûman di nav şehîd û lehengên me de cihê Mezlûm Doğan û Mahsum Korkmaz gelek xweser û taybet e.

Em bi minasebeta Hefteya Lehengên Kurdistaanê gişt şehîdên xwe bi bîr tînin, li hemberî xatire û bîranîn wan bi rêzdarî serê xwe ditewînin û ev hefteya lehengan li hemû gelê me pîroz be, dibêjin.



Kesin ji heyeta îtalî, ji milê rastê ve: Rojnameger Enrico Fovanna, parlementer Angela Bellei, Anna Marcani û keça wê Daria Dell'Antonia û Alessandra Muricci.

**Ji bo çavdêriyê di Newrozê de gelek delegasyon hatin Tirkiyeyê; piraniya wan jî çûn Kurdistanê. Ji van heyetan, heyeteke îtalî roja 23'ê adarê hatin serdana Azadiya Welat jî. Hevalê me SAMÎ TAN hin pirs arasteyî wan kirin. Ji heyetê, Daria Dell'Antonia hem pirsên me bersivandin û hem jî gotinên hevalên xwe ji me re wergerande îngilîzî. Em vê hevpeyvînê pêşkêşî we dikin.**

● *Hûn dikarin li ser delegasyona xwe, me agahdar bikin?*

– Em delegasyoneke îtalî ne û ji 11 kesî pêk hatine. Ji bo Newrozê em hatin ku rewşa kurdan li Tirkiyeyê, bi taybetî jî li Kurdistanê bibînin. Di nav delegasyona me de endameke parlamentoyê Angela Bellei, ku ji Koma Komunîst e, heye. Ji bilî wê, nûnerên sendîkayan, nûnerên Komeleya Aştî û Piştgiriyê, endamên komeleya bi navê "Pira ber bi Amedê ve" (komeleyeke ku ji bo piştgiriya Kurdistanê xebatê dike) hene. Her wiha di nav me de ji kesên ji komîteya bi navê "Comittato Goulfo" heye. Ev komîte li ser têkiliyên navneteweyî, bi taybetî jî li ser şer weşanekê derdixe. Dîsa di nav me de endamên hinek komeleyên din û rojnamegerek ji rojnameya "Il Journo" cih digire. Ev kes di heman demê de nivîskar e jî, pirtûkeke wî li ser Kurdistanê heye. Ew pirtûk bi şêweya romanê hatiye amadekirin û naveroka wê li ser Kurdistanê ye. Pirtûk wê di mehên pêş de bikeve çapê.

Em çûn Kurdistanê, em 5 rojan li Amedê man. Me li Amedê gelek tişt dîtin, em çûn serdana malên li derdora Amedê, em bi mirovan re peyivîn. Me xwest, em derkevin derveyî Amedê, biçin Licê, Sêrtê, heta Culemergê. Lê destûr nedan ku em derkevin derveyî Amedê. Me Newroza xwe li Amedê derbas kir, em beşdarî pîrozbahiyên li "Batıkent"ê bûn. Di vê pîrozbahiyê de 5 hezar kes hebûn. Serokê HADEP'ê Murat Bozlak jî hate axaftinek kir, gel pir bi aram bû, bi dilekî şad Newroz pîroz dikir. Piştî axaftina Bozlak, polîsan gotin, pîrozbahî qediya, milet belav dibû, lê dîsa jî ew bi sê tankan ketin pey gel. Li wir 6 polîsên resmî û gelek jî yên sivîl hebûn. Paşê em hîn bûn ku, 15 mirov hatine girtin û hin kes jî birîndar bûne.

Em hatine vir ku tiştên diqewimin, bi çavên xwe bibînin. Me wêne kişandin, bi mirovan re hevpeyvîn çêkirin. Piştî ku em vegerin, emê gelekî bixebitin; ji bo ku gelê îtalî agahdar bikin der barê rewşa vê derê de. Em berê jî dixebitîn, me kampanyayeke li dijî firotina çekan a ji bo Tirkiyeyê daye destpêkirin. Me xwe bi rêxistin kiriye, heta ji bo piştgiriyê me sê tûrneyên konserê organîze kirine; em di parlamentoyê de xebatê dikin. Angela Bellei vê xebatê di nava Komeleya bi navê "Aştî ji Kurdistanê re" tevî 114 mebûsên din, dimeşîne. Kesên di nava vê komeleyê de bi hemû şiyana xwe dixebitin ku bandorê li hikûmeta îtalî bikin, da ku peywendiyên baş ên di navbera wê û hikûmeta tirk de qut bibin.

● *Hûn çûn Kurdistanê, hûn karin li ser rewşa gelê kurd û bandora şer çi bibêjin?*

– Me dizanibû ku li gelê kurd îşkence tê kirin, lê cara yekemîn e ku ez diçim Kurdistanê, ez gelekî di bin bandora rewşa gel de mam. Min gelek mirov dîtin ku ji piyên xwe qop bûn. Wisa xuya bû ku gelek însan ji ber îşkenceyên hêzên tirk ji piyên xwe bûbûn. Me rewşa mirovên ku ji cihûwarên xwe bûne û niha li derdora Amedê dijîn, dît û li ser vê mijarê me gelek belge bi dest xistin. Me fêhm kir ku, em hatine welatekî di bin dagirkeriyê de lê şer heye. Min li welatê xwe tu car ew qas çek, leşker, polîs û sîxur bi hev re nedîtine. Di pêvajoya hemû gera me de, li pey me polîs hebûn. Dema em hatin Stenbolê jî, polîsekî ji hevalê me pirsî ka emê biçin kîjan hotelê. Ji bo me ew êrîşeke mezin e, li tu welatên demokratîk tiştên wisa çênabin. Hikûmeta me, Tirkiyeyê weki welatê demokratîk dizane, lê em nikarin ji vê yekê bawer bikin.

● *Nêzîktêdayîna gelê îtalî ya li ser kêşeya kurd çawa ye? Li ser vê mijarê çi tê zanîn?*

# Me fêhm kir ku em

**Em agirbesta PKK'ê ne wekî nîşana qelsiyê, lê wekî nîşana xurtbûnê dibînin. Ew bi vê yekê nîşan dide ku diyalogê dixwaze. Hikûmeta tirk jî bi vê helwesta xwe nîşan dide ku diyalog û çareseriya meseleyê naxwaze.**

**Kêşeya kurdî li Îtalyayê hîn gelekî nû ye. Lê, dîsa jî wekî me berê jî got di parlamentoyê de komeleyeke ku piştgiriya kurdan dike heye, bi navê "Aştî ji Kurdistanê re." Ew zor dide endamên parlamentoyê da ku ew binpêkirina mafê mirovan ên li Tirkiyeyê bibînin.**



Li Amedê, ji Newroza 1996'an dîmenek.

–Bi dîtina min li Îtalyayê agahiyên gelekî xerab li ser kêşeya kurdan hene. Berî sê salan, di hin rojnameyên ewrûpî de li ser tûrîstên ku ji aliyê gerîla ve li ser çiyayê Agirî hatibûn girtin, hinek nûçe derketin. Hingê me fêhm kir ku, li Tirkiyeyê kêşeya kurdî heye. Piştî wê hinek kesan li ser vê meseleyê dest bi xebatê kir. Lê, di warê peydakirina agahiyên rast de gelek arîşe hebûn, ji ber ku rojnameyên îtalî bi tenê dîtinên aliyekî didan. Di nava xebatê de, ji bo peydakirina agahiyên rast, me hinek rê dîtin. Me hinek rojname û radyoyên ku li ser vê kêşeyê hesas in, nas kirin. Ez bawer im, vê delegasyona me jî gelekî bisûd be, di warê agahdarkirinê de.

● *Papa John Paul li ser kurdan hinek mesajên piştgiriyê dan, wî got: "Mafê gelê kurd ê aştiyê heye", hûn vê çawa dinirxînin?*

– Erê, wî di roja sersalê de dema qala Rojhilat kir, li ser kurdan jî hin tişt gotin. Di 25'ê berfanbarê de delegasyoneke mezin a jinên kurd ji Ewrûpayê hatibû, ew çûn ba Papa. Wî jî di axaftina xwe ya Chrismasê (sersal) de gote ku mafê gelê kurd ê aştiyê heye. Wekî şexs baweriya min ev e ku Papa kare ji bo gelê kurd tiştên ji wê bêhtir bike, lê ew gotin, ji nekirina tu tiştî çêtir e.

● *Helwesta hikûmeta îtalî ya li hemberî gelê kurdan çi ye?*

–Hikûmeta îtalî bi hikûmeta tirk re xwediyê peywendiyên baş e. Li ser kurdan jî tu eleqeya wê nîn e. Bi awayekî fermî hikûmeta îtalî hebûna şerê li Kurdistanê napejirîne. Kêşeya kurdî wekî meseleyeke hundirîn a dewleta tirk û wekî meseleya terorîzmê dibîne. Lewre dijwariya yekemîn a li ber me, danfêhmkirina binpêkirina mafên mirovan a li vir û nîşandayîna jenosîda ku tê kirin e. Lewre, bi awayekî fermî nayê pejirandin ku, li Tirkiyeyê jenosîdek li ser mirovên sivîl heye.

● *Hûn karin li ser tevgera demokratîk, bi taybetî jî ya komunîst a li Îtalyayê çi bibêjin?*

– Partiya komunîst, her tim di warê nakokiyên li seranserê dinyayê de çalakdar bûye, her wisa di warê kêşeya kurdî de jî çalakdar e. Di parlamentoyê de, hinek komên din ku bi çavekî baş li kêşeya kurdî dinêrin jî hene, lê hejmara wan hindik e. Kêşeya kurdî li Îtalyayê hîn gelekî nû ye. Lê, dîsa wekî me berê jî got, di parlamentoyê de komeleyeke ku piştgiriya kurdan dike heye, bi navê "Aştî ji Kurdistanê re." Ew zor dide endamên parlamentoyê ku ew binpêkirina mafê mirovan ên li Tirkiyeyê bibînin. Di vê komeleyê de ji hemû partiyan mebûs hene, lê hemû endamên partiyan neketine bin bandora vê komelê. Ji her partiyê şexs tevî komeleyê bûne. Ew gelekî dixebitin, bi taybetî der barê binpêkirina mafên mirovan de.

Dema Özgür Ülke hate bombekirin, wan ev bûyer anîn rojeva parlamentoyê. Bûyer, wekî kirineke ne–mirovî ji bo birîna gelekî hindikahî, hate diyarkirin û hate gotin ku, divê ev tişt neyê pejirandin, mafên kurdan bên nasîn.

● *Li gorî nirxandina we, çima dewletên ewrûpî, piştgiriyê didine Tirkiyeyê?*

– Ji bo ku dewletên ewrûpî, ji gelek aliyan ve girîngiyê didin Tirkiyeyê. Ew ji aliyê aborî ve girîngiyê didinê, da ku ew çekên xwe bifiroşin Tirkiyeyê, jê gelek pereyan kar bikin. Cihekî girîng didin Tirkiyeyê, di warê stratejîk de. Ji ber ku ew li Rojhilata Navîn Tirkiyeyê wekî hevalbendekî mezin dibînin. Lewre jî gelek sedemên wan hene, ji bo ku alîkariya Tirkiyeyê bikin.

Dîsa, Tirkiye endamê NATO'yê ye, ji ber vê jî dewletên ewrûpî divê çekan bifiroşinê û di warê aborî û siyasî de rê li tengaviyên wê bigirin. Ji bo vê wan Tirkiye xist nava Yekîtya Gumrikê.

● *Nûnerên komunîstan di Parlamentoya Ewrûpayê de hene? Heke hebin çi xebatê dikin?*

– Nûnerên wan hene di Parlamentoya Ewrûpayê de, lê ne gelek in. Wan li dijî ketina Tirkiyeyê ya nava Yekîtiya Gumrikê xebat kir. Niha ji bo ku Tirkiye nebe endamê Yekîtiya Ewrûpayê, ew xebatê dikin û binpêkirinên mafên mirovan li Tirkiyeyê protesto dikin. Lê ji ber ku hejmara wan ne gelek e, zêde tesîrê nakin.

● *Li ser PKK'ê hûn karin çi bibêjin? Gelo PKK tevgereke sosyalîst e, an neteweperest e, çi ye?*

– PKK tevgera rizgariyê ye, tevgera azadiyê ye ku gelê kurd temsîl dike. Ji ber ku, tu riyên din li ber nemane, ew bêgav maye ku rahêje çekan.

Di vî warî de rojnameger Enrico Fovanna cuda difikire, ew dibêje: "Divê PKK çekên xwe deyne, da ku ew wekî aliyekî diyalogê were pejirandin.

Lê, Mebûsa Koma Komunîst Angela Bellei li dijî wê dîtinê, bi bîr dixe ku Zapatîstan hikûmet kişandine ser maseya diyalogê. Ji ber ku mînakên bi wî rengî hene, hewce nake PKK çekên xwe deyne.

● *Li Tirkiyeyê hin sosyalîst, komunîst agirbesta PKK'ê wekî teslîmbûnê bi nav dikin, hûn çawa dibînin?*

– Enrico Fovanna agirbestê wekî nîşana niyeta PKK'ê ya ji bo vekirina riya diyalogê û wekî gaveke bikêr dinirxîne.

● *Dewleta tirk bersivê nade agirbestê, bi PKK'ê re nakeve diyalogê?*

– Em agirbesta PKK'ê ne wekî nîşana qelsiyê, lê wekî nîşana xurtbûnê dibînin. Ew bi vê yekê nîşan dide ku, diyalogê dixwaze. Hikûmeta tirk jî bi vê helwesta xwe nîşan dide ku diyalog û çareseriya meseleyê naxwaze.

● *Ez dixwazim pirsa xwe ya li ser helwesta sosyalîstên tirk arasteyî birêz Angela Bellei bikim.*


– Ew wekî komunîstên îtalî, PKK'ê wekî tevgera rizgariyê dibînin û hurmetê nîşanî biryara wê ya li ser agirbestê didin. Angela Bellei agirbestê wekî nîşana xwestina diyalogê û cesareta PKK'ê dibîne. Ew dibêje: "Bi ya min ev dîtina sosyalîstên in tirk ne di cih de ye. Komunîst ne mecbûr in li ser her mijarê wekî hev bifikirin."

● *Wekî pirsa dawîn birêz Bellei rewşa tevgera komunîst bi giştî çawa dinirxîne?*

– Ew dibêje ku wê li ser welatên Rojhilat tu nirxandin nekiriye. Ji ber ku ew wan wekî şêweyeke dîktatoriyê dibîne. Her wiha ew diyar dike ku divê komunîstên her welatî li gorî rewşa welatê xwe bifikirin, tiştên ku pêdiviya gelê wan pê heye, bikin.

# ...tine welatekî dagirkirî

# Şerecûniya çîrokbêjan



**Cihê çîrokbêjiyê jî wekî dengbêjiyê di nava gel de pir girîng bû. Dema dengbêjekî xerîb bihata gundekî, mirovên wî gundî bi temamî berhev dibûn, diçûn bi saetan li wî guhdarî dikirin. Heta dengbêjên wî gundî jî hebûna, bi wî dengbêjî re diketine berebaziyê û kê zêde kilam bigota, xelata mezin jî, wî distand.**

Edebiyata me ya devkî, di warê helbest û çîrokan de xurt e. Di nav kurdan de, ji ber ku zimanê nivîskî,bi cih nebûye edebiyata kurdî ya devkî bi çîrok, helbest, destan û hwd. ve hatiye hate îro. Ji ber sebebên asîmîlasyona ku ev heftê sal e, li ser kurdên Tirkiyeyê tê meşandin dewlemendiyên wêjeya hatine kurdî jî qetilkirin.

Çîrokên ku di zaroktiya me de ji aliyê dewrêş û feqiyan ve dihatin gotin, pir bala gel dikişandin. Ji ber ku ew mirov her tim digeriyan; ji her gundî tiştek digirtin. Dema ku li hin cihan rûdiniştin ew çîrok, destan û helbestên ku berhev kiribûn digotin. Gel jî ew bi awayekî xelat dikirin û tiştên ku wan digotin jî, ji ber dikirin.

Cihê çîrokbêjiyê jî wekî dengbêjiyê di nava gel de pir girîng bû. Dema dengbêjekî xerîb bihata gundekî, mirovên wî gundî bi temamî berhev dibûn, diçûn bi saetan li wî guhdarî dikirin.

Heta dengbêjên wî gundî jî, hebûna bi wî dengbêjî re diketine berebaziyê û kê zêde kilam bigota, xelata mezin jî wî distand.

Giringiya çîrokan jî bi awayekî din bû. Heke du kesên çîrokbêj li cihekî bihatana cem hev, ew her du kes jî wekî ku dengbêjan çawa diavêtine ber hev, ew jî bi hev re diketine berebaziyê. Yekî çîrokek digot heta demekê, îcar berdewama wê jî, yê din digot. Di navberê de jî bi avêtina ber hev, hev û din tahrîk dikirin. Li jêrê ji vê rewşê re ez dixwazim cih bidim çend rêzên ku çîrokbêjên herêma Serhedê avêtine ber hev.

**Dewrêş**

Ez Dewrêş im, qelûnkêş im
Bi destê xwe yê rastê
Zikê baz diqelêşim
Bi destê xwe yê çepê dipêjim

**Baz**

Ez Baz im, bazekî belengaz im
Ji dil û cegerê xwe bênaz im
Bêdeng û bêawaz im
Ez bi tenê zimanê te dixwazim

**Dewrêş**

Bazê zerikî qûnterikî
Sercucikî tirsonekî
Min hêrs nekî
Ezê te bikim wekî rismekî

**Baz**

Ez teyr im teryekî xerîbkî
Pencên min pênckî
Serê Dewrêş dixim qapanekî
Zimanê Dewrêş ji min re wekî
dermanekî

**Dewrêş**

Çil li wî virî, çi li wî tirî
Hestiyê stûyê te wekî mûkî
Çavên serê te wekî morîkî
Pencên piyên te xeynî rêxbelakirinê,
nayê kêrî tiştekî

**Baz**

Lepek herî, du lep herî
Min li şikilê Dewrêş nihêrî
Sosretek çêkir ji bo alemekî
Zimanekî arşûnek dirêj,
Ji xebardanê pê ve naxwe tu gûkî

**Dewrêş**

Aha vir de, aha wê de
Serê Baz notila xurde
Ji nikulê Baz wir de
Pirtepirta rihê wî tê vir de

**Baz**

Çil çêlik û çil mirîşk hela vir de
Ji tirsê porê serê te bûye hirî de
Teqeteqa dilê te tê min de
Dibe ku Dewrêş baz de ber bi
mala xwe de.

**Dewrêş**

Ez siwar im, siwarê keleşê sermêş
Ji vir diçim qiyametê bi meş
Tirsa min nîn e ji Bazê sereş
Heke serê wî bi destê min dikeve
ez çawa dixime leş

**Baz**

Hare were bi meş
Çavên te yên sorbûyî bûne wekî leş
Ez pir bidim ji hêla reş
Bi nikulê xwe yê şêr, derxim her du
çavên te yê, reş

**Dewrêş**

Hey Bazo belengazo
Stûxwaro bêwaro
Xwedî du perê ziravo
Heke tu dikevî bin lepê min,
çawa te dixim mira

**Baz**

Dewrêşo qelûnkêşo
Serseriyo, serbiêşo
Enî dindoko, zik beroşo
Destbixwîno, çavbirçiyo...

**Dewrêş**

Şev qediya çavên Baz diriya
Her kes bi Baz keniya
Dewrêş Baz kire wek miriya
Bazê bûye wekî cilê bin piya

**Baz**

Dewrêş biharê reviya
Zivistanê wekî miriya
Havînê wekî tolazan geriya
Payîzê, ji ber birçîbûna Dewrêş,
Mişk neman li zevi


**Baz û Dewrêş**


Carek ji caran
Rehmet li dê û bavê guhdaran
Îcar jî cemateke wekî her caran

Bi xatirê we hemû gundî, rêncbe
şervan û xebatkaran.

BERHEVKA
METİN AKSO

# 'Adir u Asme' û 'Gome'




Sera parene kitavxanu de di kitav ginay ve çimonê ma. Hurdemenay ki newey vî. Na neweyen her hetra viye. Zon newe vî. Na zon de şiîr nûstene newe viye. Kitavê şiîrî zon çap kerdene newe viye û wendoxî kitavu newey vî.

Kitavxane Piya na hurd kitav çap kerde. Virende kitavê Qemerê Alî "Adir û Asme" vejiya: Adir û Asme de çevres û ju şiîr esto û tê de kirmanckî (zazakî) ame nûstene. Qemerê Alî Dersîm de amo dina. Nika Almanya de ro. Naye ra aver ju na kitavê Qemerê Alî vejiyo. Na kitavî xeleta Musa Anter hete doskariye ra gureto. Gurenayisê Qemerê Alî teyna kirmanckî nûstene ser niyo. Kitav ra hen mûseme qe Radone Duisburg de hîre serî zone kirmanckî de program virasto. Zone xu rind zoneno Qemerê Alî. Eve zonayis û zerra vate na şiîr. Ca caye zon beno hosta û be neqes. Je uwa derû, je asmen pak û zelalo. Niya vano *(ti nas nêkena estena toxîm / hêgaude / eke mîrçîku peyde qut werdene / qeto hêgayî sakkerdî / birna eve na tore qute yîne / ez naye naskenû yî sone / waxt qeame onca yene / eve haştiye.)* Dewe welatî yene çimonê Îson ver. Payîza wertiye de ke cite ramîna. Hengaj verde hega demdino, xelekî vejîne. Gay qefelîne citkar gozriye cîneno û hengaj orozneno ra dare... Hete binra şiîronê Qemer de esq esto, haştiye esta efkare welat esto. *"Be to ontene / tora ontene ra rinda"* vano cayede kî yare ra... Gegane welatra dur mendene, qom e xo ra vişaye mendene dana vatene saîr. Rozune virenû, waxte viren anora xu vîr. *"Çî weşvî / waxtoke / ma şiyene waru / xortu / çeneku ne ozevu / rayera govende guretene"* Qulo qe harde xora dur pero, qulo ke milete xora vişaye mendo, qulo ke na dîna sere gurvetiye de ro, yî ke çî hesnene, yî ke çî anera xu vîr, yî ke hesreta çîg oncene. Saîr kî aye hesneno, aye anora xu vîr hasrete onceno. Gegane rî wayîso, ge pezmûn û murozûno. Ge olaxûne Almanya de ro, gekowune Muzir de. Hete muzir ser zere xu tenîko. Ju kî diyaxe xo esto. Diyax keno qe *"a roze kî yane / deşî rîjîne, dese xepisxanu / û waxt / endî deste to kelepçe niye / xepisxaney çîne, tomete kî / Domone to kî bene / û ti cire kurnîkede / lorîka haştîe vana.*

Kitavo kirmanckiyo de bîn kî "Gome" Kemal Astare'iyo. Kemal Astare kî Almanyade ro. Kirmanconê Erzîngan ra wo. Zone kirmanckî ser nara ave kî gureye xu esto. Di sera ave jû na kitave xu vejiya Weşane Doz ra. "Car hard cor asmen" Na kitav de Kemal Astare Dersîm ra, weşena qome mara qal ano ra, "Gome" şiîroneê xoser ra amo meyda. Kitav de hotaw û new (79) şiîr ca cene. Her veng ra, her bavet ra her gal ra şiîr yene diyane. Welat û bêkeşiye ser, haskerdene û esq ser, sosyalîzm û polîtîka ser ..... Dersîm, Almanya, herv, adir, Sêwas û 37 can, dewe Pulûr, bone vesayî.. Saîr pera virenera pera peyene zere xo dano tever.

Çutir ke ame zerera hen vano rindekena vatene ser jede ne vindeno. Caye caye de çeqoy şikine ra jumînî ca caye kî xo ser sone. Saîr wazeno ki qesê xo vazo. Zerhe xo wendoxî ver sano. Çutîr vatene hondek muhîm niya. Naye sere jede ne vindeno. Xu nano re hesnaen û diyax ser. Ca caye de teynaen esta *"Gegane dîna de / ne doste ma esto / ne kî kese ma... Gegane hen teyna hen bekes / werte kemeru û kuçu de"* vano.

Qesa saîr jede welat sere wa. Welat şiîrone Kemal Astareyî de zof ca ceno. Her qese peniye de welat anora eyî vîr. Vano qe "Tora has ken, welatê neçar" caye de kî niya vano. *"Zone mordemî ke birriya / bilbil qe waneno?"* Roza ewruene sere kî qesê eyî esto. Peredayîsê kirmancî re poşt dano. *"Birre Muzirî veseno sodir sond. / Bone xalike gule vesa naxir tey merd"*.

Gegane efkar keno hale na waxt re vano *"welat tu key royena?" "Welat tu key xeleşîna"*. Ca caye de saîr reseno, qesa xoriye, binra, barîra nano pa. Îson hen xiyal keno maneno. Je na çekuy *"roe mi ser hazar derd veseno. / Van deste xu direbetia mi ser mene"*

Venge saîr zelalo, naturelo çeng xo ne keno. Qesê xo eve retiye vano. Haştiye wazeno jede kî. Çike haştiye veşiye û dîna kena rindeke. Haştiye de esq û çef esto. Axuzare haştiye maneno.

Tarîxe made na sere peyen çiqaş muhîmiye. Sera 1995 de kî zof neweyî kut weşeniya ma. Nînera jû kî zone kurmanckî de kitave şiîriye. Çiqaş qe zof ca de zone şiîr pê nêceriyo, çiqaş ke xeyle kemiye bi vo kî na hurd kitav dialekta kirmanckî de cao de muhîm cene û gama virene ane hurend. Xêreser nara dima kî na hetra herke şî ave some û roz ve roz zone ma de newe nûştox û kitave xas û rindek yene meydan.

S. MAMEKÎ

# Di giriyê me de kenekî şîrîn heye

DILBIWXÎN DARA



Di van dawiyê de, min xwest bi stîleke hinekî cuda, bi şêweyeke din çend tiştan ji dilê xwe bi dilsozî ji xwendevanan re bibêjim. Bi rastî dema ku ez dinivîsim, berî her tiştî ez xwendevanan tînim pêşiya çavên xwe û li gorî wê, atmosferekê çêdikim. Bi hemû awayî ez hewl didim xwe ku, di nivîsên min de xwendevan xwe bibînin. Ez ne ji xwe re ji wan re dinivîsînim. Bi vî rengî ez dixwazim diyalogê bi xwendevanan re deynim.

Belkî çavên pênûsan wekî hemû çavên din li bûyeran nanêrin, belkî êşa di dilê pênûsa min de, ne wekî êşên yên din e. Her çavek tiştekî dibîne, her gulek jî bi rengekî bêhn dide. Mixabin, hinek xwendevanan nivîsên min şaş xwendibûn. Ev jî rastiyek e, her kes nikare wekî hev bi tiştan bihese. Li ser nivîsên min ên vê dawiyê, hevalekî nêzîk wiha ji min re got: "Dema ku ez nivîsên te dixwînim, giriyê min tê. Di nivîsên te de mirov êşê dibîne, dijwarî, zorî heye. Di nivîsên xwe de tu, tu caran nakenî. Wekî ku tu li ser miriyekî şînê bigerînî..."

Hevalekî din jî, piştî ku nivîsa Helepçeyê xwendibû, hêrs bû û wekî ku destê xwe têxe gewriya min, "Bes e! Dev ji vê stîlê berde, te ez kuştim. Min nikaribû ez nivîsê biqedînim, çavên min tijî hêstir bûn. Wekî ku ez berî 8 salan di nava kuştiyên Helepçeyê de bim. Gelo, însanên me wiha hatine kuştin! Destê xwe ji qirika min derxîne û careke din min nekuje", gote min. Hevalekî din jî wiha got: "Stîleke nû ye, baş e. Berdewam bike. Di dilê her kurdekî de êşek heye. Tu caran tu kurdekî ku êş nedîtibe, nabînî. Em sirgûn bûn, li devê riyan hatine kuştin, li ber dîwaran bêçare man, bi ser serê me de banî hilweşandin, keçên me yên bedew û ciwan di bin xwe de fetisandin.. û li dawiyê navê me jî guhartin. Çi di dest me de hiştin? Çima em li serê negirîn?"

Gelo tenê girî ew e ku mirov di çavên xwe de hêstiran bibîne? An jî mirov ew e ku mirov xwe di gorê de bibîne? An jî jiyan ew e ku mirov di canê xwe de ruhekî bibîne? An jî ken ew e ku mirov devê xwe veke û diranên xwe nîşanî derve bide?!

Di navbera jiyan û mirinê de, çi heye, em çi dibînin? Di navbera ken û girî de jî çi tê dîtin? Em ji çîrokan bêhtir, werin ji hev re hinek rastiyan bibêjin. Bêguman rastiyên ku em bibêjin ji vê koşeyê mezintir in. Wê ev koşeya teng bikaribe kîjan rastiyê hilgire û kîjanê jî biparêze?

Her rojeke jiyana me, romanek e; her berxwedaneke me destanek e; ji şer û aştiyê mezintir e. Lê belê em nikarin romanê binivîsînin. Li pêş çavên me keçên kurd xwe di nava êgir de ji bo azadiyê dişewitînin, em nikarin helbesteke ku layîqî wan be binivîsînin. Şoreşa me ji Şoreşa Oktoberê jî mezintir e, lê belê me çavên xwe girtine û em naxwazin tifinga li ser milê gerîlayê xwe bibînin. Me dest avêtiye kompîturê û em çîroka jiyana xwe dinivîsînin.

Rast e, hinek caran pênûsa me van tiştan dibîne. Nikare bêdeng bimîne, dibêje. Li ser çi dibêje? Di nivîsên xwe de hinek caran hûn laşên miriyan dibînin. Hinek caran hûn zarokên şehîdan dibînin. Hinek caran hûn kuştiyên Helepçeyê, girtiyên zindanan, hesreta di dilê dayikan de, nameyên gerîla û wêneyên şer dibînin. Belê, hinek caran girî, hinek caran jî kenekê dibînin.

Eger em di nivîsên xwe de bigirîn jî, bizanibin ku di giriyê me de kenekî şîrîn heye. Eger em keseran bikişînin jî, di wan keserên me de, hêvî hene. Eger ne ew hêvî bin, ne tenê carekê emê her roj bimirin. Em wekî însanên din jiyan nabin, di mirina me de jî jiyan heye, car caran ji bo ku em bijîn, em dimirin û em bi dengekî bilind bang li xoceyên mizgeftan dikin: Werin li ser mirina me telqînê bixwînin. Belkî hûn van nivîsan wekî nivîsên din nexwînin. Dibe ku gotinên di van nivîsan de, dilê we biêşînin, lê belê di bin her gotinekê de stêrkek heye, gulek heye. Di bin her gotinekê de, jiyaneke nû heye. Û eger ku giriyê we hat jî, bizani bin, ez di wê giriya we de, kenekî şîrîn dibînim. Li dawiyê jî em bi hev re, destê hev dişidînin û ne tenê em, wê her kes di dîlana me ya azadiyê de cih bigire. Emê hemû êşan bikujin. Min dixwest li şûna vê nivîsê, li ser "teqlîdê" tiştekî bibêjim, lê belê ji bo ku ev nivîs şaş neyên xwendin, min pêwistî bi nivîseke wisa dît. Bila "Teqlîd" jî ji bo careke din bimîne.



# Şerê bêjingê û axa

Bi navê Teter, axayek hebû, li navçeya Misircê (Kurtalan) dijiya. Teter Axa pir bi hêrs bû. Li ser tiştekî biçûk, zû diqehirî.

Rojekê jina axê, hinekî dexl bêjing kir û bêjinga xwe danî erdê. Dexlê xwe bire ser kaniyê, ji bo ku bişo. Axa ji hundirê odê derket, du sê caran gazî jina xwe Zulfê kir.

Kesek bersiva wî neda. Axa pir aciz bû, bi dengekî xurt û nerazî got: "Ev kesek tune di vê xopanê de."

Hate salonê, lingên axê ber bêjingê ket, di ser de qulibî. Teşka (ling) axê şikest. Vê carê Teter Axa bêhtir bihêrs hate û xencera xwe anî der û bêjing da ber xenceran. Di xencera ewil de destê axê şikest. Ew hêja bêhtir qîriya.

Dest avête bêjingê, heya jê hat, girt li diwarê odeyê da. Bêjing vezirigî (zıpladı) li tehtê eniya Teter Axa ket. Enî jî şikest. Axê dît nekare rabe ser xwe, kete erdê.

Jina Teter Axa Zulfê hate, li rewşa axê mezê kir û got: "Lawo heklo, kê bi serê te de ev yek aniye?" Axa bi nalînên xwe got: "Bêjing e, bêjing e, bêjing e."

HEMEDOK DILOVAN

# Berxê min mê n

Leşkerekî tirk diçin gundekî, di rê de r gundiyekî tên. Bi gundî re du berx hene, du berxê wî jî mê ne.

Leşker jê re dibêje: "Nereye? (Bi ku de)" Ê gu dibêje:

–Berxê min mê ne. Leşker fêm nake, dîsa dib "Nereye?" Ê gundî dîsa dibêje:

–Wele berxên min mê ne. Leşkerê tirk çavê sor dibin û dibêje: "Ez ji te re dibêjim bi ku (Ben sana nereye gittiğini soruyorum.)" Li ser yekê gundî neçar dimîne û dibêje:

–Heyra Xwedê nehêle, hema bila nêr bin.

SIMAYÎL TEM

# Bihuşt sê tebeqe y


Rojekê sê zilam; yek fileh yek ji cihû û misilman bi hev re rûdinin û sohbetê di Demek bi şûn de behs tê ser qiyametê. fileh dibêje: "Bihuşt sê qat e û emê qata binî bi misilmanan."

Yê misilman aciz dibe, dibêje: "Kuro ker b Ma bihuşt ya bavê we ye ku hûn tebeqeya binî dine me?" Yê fileh û yê cihû dibin yek û dibêjin misilman, ku ew bivê û nevê ew e! Kesê misilm dibêje wan: "Baş e! Wê dergeh ji ku derê ve, h ba we?"

Zilamê fileh, "Ji qata we, diçe jor...!" dibêje.

RÊBER RO


## XELAT...





### Bersiva Xaçepirsê (9)

Xaçepirsa me bixelat e.
Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 11'an kitêba **Qemer ê Alî** **"Adır û asme"** ye.






***Jêrenot:***
*Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.*

Kesên ku xelata xaçepirsa 9'an kaseta **Koma Azad "Şemal"** qezenc kirine: Niğmetullah Uyanık/ İstanbul, **Gülistan Öncü/Mardin**, İbrahim Coşkun/Manisa, **Sadi Çözgen/Muş**, Nesih Akgül/Şanlıurfa, **Safiye Akdağ/İzmir**, Seyfettin Söyler/Şanlıurfa, **Ömer İlhan/Mardin**, Celal Yılmaz/İstanbul, **M. Salih/Batman.**

## XAÇEPIRSA BIXELAT (11)





## XAÇEPIRS




# Sempozyûma navneteweyî ya perwerdehiya bi zimanê zikmakî

**Wextekê Celal Bayar li Wanê di axaftineke xwe de wiha gotibû: "Kî ji we re bibêje hûn kurd in, tû bikin li rûyê wan. Hûn tirk in." Lê, tevî çewsandin û polîtîkayên pişaftinên ên bi her cureyî, gel dev ji zimanê xwe bernedaye û bi kurdî dipeyive.**

Sempozyûmeke navneteweyî ya bi navê "Perwerdehiya bi Zimanê Zikmakî" ji aliyê Sendîkaya Kedkarên Zanist û Perwerdehiyê (Egitim–Sen) ve li Enqereyê di Salona Konferansê ya SSK'ê de, di navbera 14 û 15'ê adara 1996'an de hate lidarxistin. Gelek kesên nas, saziyên ji hundir û derveyî welêt, nûnerên partiyên siyasî, sendîkavan beşdar bûn. Sempozyûmê du rojan dewam kir. Di her rojê de, du rûniştin hatin çêkirin.

Roja yekemîn partiyên siyasî ÖDP, HADEP, İP, DBP'ê dîtinên xwe pêşkêş kirin. Dûv re nûnerên saziyên wekî KESK, Platforma Demokrasiyê ya Amedê, ÇHD, Kaf–Der û İHD dîtinên xwe pêşkêş kirin.

Di rûniştina piştî nîvro de Nûnerê sendîkaya Almanya ya zanîn û perwerdehiyê GEW'ê Prof. Dr. Klaus Liebe Herkort û Serokê Weqfa Lêgerîna Çanda Kurdî Yılmaz Çamlıbel dîtinên xwe yên li ser mijarê berpêş kirin. Roja duyemîn, di rûniştina beriya nîvro de, Doç Dr. Ali Demir, Şefik Beyaz (Serokê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê) dîtin û pêşniyazên xwe anîn zimên. Piştî nîvro Prof. Dr. Onur Bilge Kula, Doç. Dr. Fatma Gök, Nuray Şen (Seroka Giştî ya NÇM'ê), kesên ji sendîkayên Almanyayê, Hollanda, Swîsre û Norvecê beşdar bûn. Sendîkavanên biyan dîtinên xwe yên li ser mijarê, bi mînakên ku li welatên wan hatine pêkanîn, nirxandin.

Ev cara yekemîn e ku sempozyûmeke bi vî cureyî ji hêla mamosteyên tirk ve hatiye lidarxistin. Bawerî ew e ku ji vir bi şûn de êdî pirsgirêka perwerdehiyê wê bê gengeşekirin.

Ji çapemeniyê jî, bes nûçevanên rojnameya Demokrasi û Evrenselê hebûn û ji çend kovaran jî, hin kesan ev sempozyûm şopandin (takîp kirin).

Hin ji axaftvanan, der barê mijarê de ev gotin:

Cemal Ünlü (Serokê Giştî yê Eğitim–Sen'ê): Di rêznameya me de mafê perwerdebûna bi zimanê zikmakî heye. Her wiha ziman, di jiyana neteweyekê de egereke girîngtirîn e.

Engin Atasoy (ÖDP): Perwerdedîtina bi zimanê zikmakî mafekî însanî ye. Sîstema perwerdekariya laîk, divê cih bide perwerdekariya bi zimanê zikmakî.

Abdullah Saydın (HADEP): Ziman mirov û heywanan ji hev vediqetîne. Hîmê fikir û ramanê ziman e. Zimanekî pêşveçûyî, îfadeya civakeke pêşveçûyî ye. Di dezgeha perwerdekariya Tirkiyeyê de, pişaftina spî heye. Dewletê derfeta perwerdedîtina bi zimanê kurdî nade zarokên kurd û ziman qedexe kiriye. Dibistanên ku li herêma kurdan ava kirine, leşkerên xwe tê de bi cih kirine û di poleyekê de niha 90–100 zarok tê de perwerde dibin.

Bedri Gültekin (İP): Ev pirsgirêk tevî demokratîkbûnê bi du xalan ve girêdayî ye.

1–Qedexebûna perwerdedîtina ji bilî zimanê tirkî

2–Di dibistanên taybet de perwerdehiya bi zimanê îngilîzî, fransizî û hwd.

Kemal Yüksel (DBP): Di dema "TÖB DER"ê de jî ev pirsgirêk hatibû rojevê. Ev pirsgirêk girêdayî pirsgirêka kurd e. Zarokên kurd dema ku dest bi dibistanê dikin, ji bo ku hînî zimanê tirkî bibin zor li wan tê kirin. Ji ber vê yekê jî, li dûrî hînbûna zanînê dimînin.

Lütfi Demirkapı (İHD): Li Tirkiyeyê demokrasiyeke nîvleşkerî heye. Azadiya dewletê bêsînor, lê ya ferdan bisînor e. Dewlet li Bulgarîstanê ji bo zarokên tirk perwerdehiya bi zimanê tirkî dixwaze, lê dema ku dor tê ser zarokên kurd, vê yekê di nav xwe de qedexe dike. Yanê durûtiyê dike.

Yılmaz Çamlıbel (Serokê Weqfa Lêgerîna Çanda Kurdî): Ziman navgîneke ragihandinê ye. Mirovên ku bi zimanekî dipeyivin, ew di pêvajoya demê de dişibin hev. Qedexekirina zimanekî jî jenosîd e.

Prof. Dr. Onur Bilge Kula (Universîteya Mersînê): Ziman, hêmaneke netewebûnê ye. Çavkaniyên zimanekî, kes, kom, civak û bandorgirtina ji zimanên din e.

Şefik Beyaz (Serokê Enstîtuya Kurdî): Zimanê neteweyekê derûna wê, derûna neteweyê jî zimanê wê ye. Her wiha Beyaz di axaftina xwe de ev pêşniyaz kirin: Divê li rojavayê Tirkiyeyê zimanê tirkî bi awayekî zimanê fermî, zimanên kurdî, erebî û hwd. jî wekî zimanên bijartî bên hînkirin. Lê li herêmên ku kurd lê dijîn, divê zimanê kurdî bibe zimanê fermî û yên din jî bibin ên bijartî. Ev yek, wê hewcebûnê ji holê rake û bihevrebûnê pêk bîne.

Nuray Şen (Seroka Giştî ya NÇM'ê): Herêma kurdan bi sedan salan e, di rewşa şer de ye. Her û her bi rûxandin û tunekirinan re rû bi rû maye. Berhemên kurdan hatine wêrankirin. Çavkaniyên dîrokî yên zimanê kurdî hatine talankirin. Nuray Şen axaftina xwe wiha domand: "Wextekê Celal Bayar li Wanê di axaftineke xwe de wiha gotibû: "Kî ji we re bibêje hûn kurd in, tû bikin li rûyê wan. Hûn tirk in." Lê, tevî çewsandin û polîtîkayên pişaftinên ên bi her cureyî, gel dev ji zimanê xwe bernedaye û bi kurdî dipeyive.

BEKİR ÇELEBÎ
RASTO ZÎLANÎ

Azadiya WELAT
Rojnameya Hefteyî (Haftalık Kürtçe Gazete)

**Li ser navê ZERYA Basın ve Yayıncılık San.Tic.Ltd.Şti. (adına), Xwedî (sahibi): CELALETTİN YÖYLER**

**Gerînendeyê Weşanê** (Yayın Yönetmeni): MEHMET GEMSİZ
**Heyeta Weşanê** (Yayın Kurulu): SAMİ TAN, AYNUR BOZKURT, RAHMİ BATUR
**Berpirsê Karê Nivîsaran** (Yazı İşleri Müdürü): DÜZGÜN DENİZ
**Berpirsê Saziyê** (Müessese Müdürü): TAHİR ELDEMİR


**Navnîşan** (Adres): Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu–İstanbul
**Tel–Fax:** 0 – 212 – 293 53 19
**Çapxane:** Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
**Belavkirin** (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım A.Ş (BBD)

# Pêşangeha hunermendên kurd

**Hunermendên kurd didin zanîn ku gelê kurd divê qudreta hunerê bibîne û li berhemên hunerî xwedî derkeve. Divê ew bizanibe berhem jî wê şahidiya janên ku gelê kurd kişandine, bikin.**


Fevzi Bilge


Türkan Akkulak


Süleyman Danışman

Li Navenda çanda Mezopotamyayê sê hunermendên kurd pêşangehek li dar xistin; di bin navê "Pêşangeha Kevneşopî ya 96'an." Pêşangeh roja 20'ê adarê vebû û heta 1'ê avrêlê domiya. Kesên ku îsal beşdarî vê çalakiya hunerî ya NÇM'ê bûn ev in: Seramîkvan Türkan Akkulak, wênesaz Süleyman Danışman û wênesaz Fevzi Bilge.

Li ser vê çalakiyê ez bi wan re peyivîm û min hin agahî ji wan standin. Min pêşî ji Türkan Akkulak dest pê kir.

Türkan Akkulak ji Xarpêtê, ji gundê navçeya Depê (Karakoçan), ji Beroj e. Dibistana pêşîn li gund diqedîne û pişt re diçe Almanyayê. Li wir jî dibistana navîn dixwîne. Dûv re jî tê Stenbolê û li zanîngehê xwendina xwe berdewam dike.. Ew dibêje:

*"Ji roja ku min dest bi vê pîşeyê kiriye vir de, destên min ji lewê (çamûrê) derneketiye."*

Akkulak dide xuyan ku gelê me zêde bala xwe nade ser hunerê û gotina xwe wiha didomîne:

*"Tercîha min bi temamî tesadûfî ye. Dema ku ez ji Almanyayê hatibûm, min xwest ku ez di Lîseya Pîşekariyê ya Keçan a Kadiköyê de bixwînim. Lê belê ji xeynî beşa seramîkê, di tu beşî de cih tune bû. Ji ber vê yekê min qeyda xwe jî di vê beşê de da çêkirin. Paşê jî ez kêfxweş bûm û min ji beşa xwe pir hez kir.*

*Di Zanîngehê de jî min li ser vê beşê (beşa cam û seramîkê) xwend û êdî min ev xebat ji xwe re kir xebata yekemîn. Ez dixwazim ku bi vî karî, ji guherîna gelê xwe re alîkariyê bikim. Heta ku em huner bi çavekî baş nenirxînin, pêşveçûneke baş ji me re zehmet e.*

*Ez ji diya xwe dizanim ku gelê kurd jî mîna wê difikire. Diya min, dema ku kesek der heqa me de tiştekî jê dipirse, bersiva wê pir balkêş e; dibêje*: "Hey lo qet qala wan nekin. Du heb keça min hene, yek bi heriyê, ya din jî bi kaxizan dileyize."


*Ji ber ku ez seramîkvan, xwişka min jî wênesaz e. Lê divê bê gotin ku, bere bere min ev kar, bi malbata xwe jî da hezkirin.*

*Li gorî min, zimanê berhemên hunerî ne neteweyî ye, ew zimanekî navneteweyî ye. Îro gelek mêvanên biyan hatin li berheman mêze kirin û ji min re gotin ku,* "Bi rastî heya ku me berhemên te nedîtin, me nekaribû gundên şewitî bianiya ber çavên xwe. Piştî dîtina van berheman, êdî em dikarin bibêjin me jana wê di dilê xwe de hîs kir." *Îcar êdî em nikarin, bi tenê li ser folklor û muzîkê bisekinin.*

***

Fevzi Bilge, li Dêrika Çiyayê Mazî, di sala 1959'an de ji dayika xwe bûye. Perwerdebûna xwe ya pêşîn, navîn û lîse li welêt bire serî. Pişt re beşa Zanyariya Civakî ya Unîversîteya Marmarayê qedand. Di sala 1991'an de dema ku NÇM ava bû, demeke dirêj li vir îdarevaniyê kir. Ji avakirina Enstîtuya Kurdî re alîkarî kir. Ew 13 car e ku berhemên xwe pêşkêşî hunerperweran dike. Wî gelek caran jî tevî hunermendên din pêşangehên hevpar vekirine. Vêga jî bi awayekî profesyonelî xebata xwe didomîne.

Wênesaz Fevzi Bilge jî li ser armanca xwe agahiyên balkêş dan. Li gorî wî, di dîroka gelê kurd de, gelek berhemên hunerî hene. Ew dibêje:


**Teswîra gundên şewitandî (xebata Türkan Akkulak)**

*"Jixwe di jiyana me de tesîra hunerê pir tê dîtin. Ji aliyê hunera wêneçêkirinê ve, bi nasnameya xwe ya neteweyî nebe jî, hunermendên kurd hene. Lê belê wan rengên jiyana gelê xwe nekarîne veguherînin zimanê hunerê û zêde nekirine. Ez dixwazim ku dewlemendiya çand û estetîka me bi destê van beşên hunerê, bên nîşandan. Ez vê pir girîng dibînim. Êdî gelê me ji qudreta hunerê fêhm bike û jê sûdeke mezin werbigire.*

*Bi mijarên ku ez nîgar dikim, dibêjim gelê min ji psîkolojiya bindestiyê êdî derkeve. Ez dixwazim bi riya berhemên xwe, ew mesajên nirxên azadiyê ji nû ve bi dest bixin. Min, di destpêkê de tîpên jinên kurd çêkirin, dûv re min xebata xwe zêdetir da ser ceribandinan. Hê jî wisa dom dike. Ez hêdî hêdî berhemên razber (abstrakt) çêdikim. Di vî warî de min tabloyên mîtolojîk jî çêkirine. Ev hemû tişt ji bo nîşandana rastiya gelê me ye. Ev rastiya me ancax bi şahidiya van berheman dikeve dîrokê û nayê windakirin.*

*Gelê me çavên xwe ji hunerên dîtbarî re girtiye, ev ne tewreke rast e. Lazim e ku di vî aliyî de jî bi pêş ve here."*

***

Süleyman Danışman ji navçeya Depa Xarpêtê ye. Navê gundê wî Çakan e. Ew jî mamoste ye û ne tenê bi nîgarkirinê re eleqedar e, helbestan jî dinivîsîne û pirtûkên wî jî hatine weşandin.

Hunermend Süleyman Danışman jî armanca xwe wiha salox da:

*"Divê em ji jiyana piştî vê têkoşînê re alîkariyê bikin; ev îmkan jî bawer dikim ku heye. Îro jiyaneke nû li pêşiya me xuya dike. Divê em hunermendên kurd jî di vî warî de xwe pispor bibînin. Di dîroka wênesaziyê de gelek dîsîplîn (rêbaz) derketine. Ez xwe nikarim bixim nava yekê, ji ber ku ez van tiştan baş nabînim. Rastiya wan li gorî min tune. Ji ber ku ew dîsîplîn dibêjin "Me guherîn çêkiriye" lê ez dibêjim ev ne mimkun e. Ji ber çi ye? Astengî ew e ku, heya sîstem neyê guherîn, ev tişt çênabin."*

Wênesaz Danışman li ser pirsa me ya ji bo nirxandina civaka me jî wiha got:

"*Gel li berhemên me bi çavê fotografan dinêre û wisa dinirxîne. Ev ji ber nezanînê ye. Gelo ewê ku quweta hunerê bizanibin, wisa dikarin bêeleqe bimînin?"*

DÜZGÜN DENİZ